ISSN: 2149-2751
e-ISSN: 2149-2751
International Journal of Kurdish Studies
http://www.ijoks.com/

Research Article

**International Journal of Kurdish Studies**
11 (1), pp. 297-313
http://www.ijoks.com

# Mîrateke Çandî Di Cil û Bergê Jinên Kurd De: Kevneşopiya Kofiyê Li Semsûrê

***Tekin ÇİFÇİ***[1]

**Received**: Feb 17, 2024 **Accepted**: Mar 8, 2025

## Kurte

Dema ku em behsa folklora kurdan dikin rola jina kurd a di veguhestina çanda kurdan de tê rojevê. Ji amadekirina xwarin û xurekan heta cil û bergan ta vegotına mamik, çîrok, kilam û çîrvanokan hemû çand bi taybetî bi rêya jinan ji nifşekî vediguheze ser nifşekî din. Yek ji taybetmendiyên folklora kurdan cureyên sergirêdana jinên kurd ango kofî (serpoş) ye. Jinên kurd yên girêdayî kevneşopiyên xwe, ji temenê xwe yê piçûk û pê ve dest bi nixûmandina serê xwe dikin. Ev yek, ji hem ji aliyê ol û baweriyê ve û hem jî aliyê kevneşopiyê ve wekî bicihanîna pêwîstiyekê ye. Yek ji peywirên kofiyê (ango "çît û kulik") ew e ku wekî amûreke xweşikbûnê ya xemla jinan bûye beşek ji jiyana rojane. Li her devera erdnîgariya ku Kurd lê dijîn, jin bi teşe û amûrên cuda serê xwe girêdidin. Heta nîveka duyemîn ya sedsala 20an li Semsûrê (Adıyaman) teşeya sergirêdana jinan "çît û kulik" e ango kofî ye. Ev xebat, li ser amûr, peywir, cure û rêbazên kevneşopiya serîgirêdana jinan ango kofiyê û rewşa wê ya îrojîn hûr dibe. Bi vê mebestê, bi jinên ku hîn kofiyê didin serê xwe an jî demeke berê kofî (çît û kulik) dane serê xwe lê paşê dev ji vê kevneşopiyê berdane re hevpeyvînên rû bi rû û çavdêrî hatiye çêkirin. Daneyên ku hatine berhevkirin hatine analîzkirin.

Di vê xebatê de hate tesbîtkirin ku teşeya sergirêdana/serpoşa jinan li gorî serdemên jiyanê (keçik, bûk, jina zewicî ya navsal, jinebî, pîrejin) de hin agahiyan dide der. Herweha li gorî mezheban, eşîran û rewşa aborî teşeyê girêdana kofiyê, reng û xemlên wê jî diguherin. Di salên dawî de keçik û jinên ciwan nema kofiyê didin serê xwe. Ji ber vê yekê hejmara jinên ku vê çandê didomînin gelekî kêm bûye. Berî ku ev kevneşopiya xweşik ji holê rabe divê xebatên tomarkirinê û lêkolînên li ser vê çandê bêne zêdekirin. Ev yek ji bo parastin û berdewamiya çand û folklora kurdan girîng e.

**Peyvên Sereke:** Folklora Kurdan, Semsûr (Adıyaman), Jinên kurd, Kevneşopiya kofiyê

**Recommended citation:**
Çifçi, T. (2025). Mîrateke Çandî Di Cil û Bergê Jinên Kurd De: Kevneşopiya Kofiyê Li Semsûrê. *International Journal of Kurdish Studies, Volume 11* (1), 297-313, **DOI**: **https://doi.org/10.21600/ijoks.1641754**

[1] Dr., Hacı Hamdiye Özdemir Secondary School, Mardin, Türkiye, E-mail: tekincifci02@gmail.com
**ORCID:** https://orcid.org/0000-0002-1003-1711

**A Cultural Heritage in Kurdish Women's Clothing: The Tradition of Wearing Kofi (Headdress) in Adiyaman**

**Abstract**

When it comes to Kurdish folklore, the role of women in the transmission of culture comes to the fore. All elements of culture, from food preparation to clothing, stories, tales and songs, are passed down from generation to generation by women. Kurdish folklore is characterised by the way women cover themselves, in particular by the custom of wearing the kofi (headdress). Kurdish women who adhere to their traditions start to cover their heads from an early age. For Kurds, this is seen as a requirement of both religious belief and tradition. Another function of the headscarf is to be used as an accessory to look beautiful in daily life. Different forms of veiling and jewellery are found in each region of the Kurdish geography. Until the second half of the 20th century, the most common form of veiling in Adıyaman was 'çît û kulik', the custom of wearing a kofî (headdress). This study aims to evaluate the tradition of wearing the kofi (headdress), the way it is tied, its elements, functions and its current status in Adıyaman province of Turkey. For this purpose, face-to-face interviews and observations were made with women who still wear kofi or who once wore kofi but later abandoned this tradition. The data obtained were analysed. In this study, it was revealed that the way women wear the kofi (headdress) gives some indications about their life stages (girl, bride, middle-aged married woman, widow, old woman). In addition, the way the kofi is tied, its colours and ornaments differ according to sects and tribes.In recent years, girls and young women prefer not to wear kofi anymore. For this reason, the number of old and middle-aged women who continue this culture in the region has decreased considerably. It is important to record this beautiful tradition before it is lost and to deepen the research in order to preserve and maintain Kurdish culture and folklore.

**Keywords:** Kurdish folklore, Adıyaman, Kurdish women, Kofi (headdress) wearing tradition

**Kürt Kadın Giyiminde Kültürel Bir Miras: Adıyaman'da Kofi (Başlık) Takma Geleneği**

**Öz**

Kürt folkloru denildiğinde, kadınlarının kültür aktarımındaki rolü ön plana çıkmaktadır. Yemeklerin hazırlanmasından giyime, hikâyelere, masallara ve şarkılara kadar kültürün bütün unsular kadınlar tarafından nesilden nesile aktarılır. Kürt folklorunu karakterize eden, kadınların

örtünme biçimi -özellikle- kofi (başlık) takma geleneğidir. Geleneklerine bağlı Kürt kadınları küçük yaşlardan itibaren başlarını örtmeye başlamaktadırlar. Kürtler için bu hem dini inancın hem de geleneğin bir gereği olarak görülmektedir. Başörtüsünün bir diğer işlevi de günlükyaşamda güzel görünmek için bir aksesuar olarak kullanılmasıdır. Kürtlerin yaşadığı coğrafyanın her bir bölgesînde farklı örtünme şekilleri ve takılara rastlanmaktadır. 20. yüzyılın ikinci yarısına kadar Adıyaman'da yaygın olan örtünme biçimi "çît û kulik" yani kofî (başlık) takma geleneğidir. Bu çalışma Türkiye'nin Adıyaman ilinde, kürt kadınlarının kullanmış olduğu kofi (başlık) takma geleneğini, bağlanma şeklini, unsurlarını, işlevlerini ve günümüzdeki mevcut durumunu değerlendirmeyi amaçlamaktadır. Bu amaçla, halen kofi takan ya da bir zamanlar kofi takmış ancak sonradan bu geleneği terk etmiş olan kadınlarla yüz yüze görüşmeler ve gözlemler yapılmıştır. Elde edilen veriler analiz edilmiştir. Bu çalışmada kadınların kofiyi (başlık) takma biçimlerinin, yaşam evrelerine (kız, gelin, orta yaşlı evli kadın, dul, yaşlı kadın) ilişkin bazı işaretler verdiği ortaya çıkmıştır. Ayrıca, kofinin bağlanma şekli, renkleri ve süslemeleri mezheplere ve kabilelere göre farklılık göstermektedir. Son yıllarda kız çocukları ve genç kadınlar artık kofi takmamayı tercih etmektedir. Bu nedenle bölgede bu kültürü sürdüren yaşlı ve orta yaşlı kadın sayısı oldukça azalmıştır. Bu güzel geleneğin kaybolmadan önce kayıt altına alınması ve araştırmaların derinleştirilmesi Kürt kültürü ve folklorunun korunması ve yaşatılması açısından önem arz etmektedir.

**Anahtar Sözcükler:** Kürt folkloru, Adıyaman, Kürt kadını, Kofi (başlık) takma geleneği

## Destpêk

Dema ku em behsa folklora kurdan dikin rola jina Kurd a di veguhestina çanda Kurdan de tê rojevê. Lewre, tê zanîn ku ji amadekirina xwarin û xurekan heta cil û bergan ta mamik, çîrok, kilam û çîrvanokan hemû çand bi dest û devê jinan ji nifşekî vediguheze ser nifşekî din.

Yek ji taybetiya folklora kurdan û remza jinên kurd cureyên sergirêdana wan, ango serpoşî û xêliya wan e. Jinên kurd -yên salên dawî ne tê de- ji temenê xwe yê piçûk û pê ve dest bi nixûmandina pora xwe dikin. Ev yek, ji aliyê ol û baweriyê ve wekî bicihanîna pêwîstiyekê ye. Ji aliyê din ve wekî amûreke xemla jinan bûye beşek ji jiyana rojane. Li her devera erdnîgariya kurdan jin bi teşe û amûrên cuda serê xwe girêdidin. Amûrên girêdanê û navlêkirina wan li gorî herêman diguhere. Wek mînak, li herêma Mêrdînê jin çarikên sipî û dirêj didin serê xwe û bi

hibriyan dora sere xwe girêdidin. Li herêma Rihayê jin, kumekî ji rengê qedîfeyê didin sere xwe û kitaneke xemrî (mor) davêjin ser serê xwe. Li herêma Serhedê jin kitaneke spî ku dora wê bi morî û mircanan hatiye neqişandin didin serê xwe. Jinên navsal û bawermend çarik û kitanên xwe naxemilînin û qet rê nadin ku pora wan ji der ve xûya bike. Helbet mijar ne tenê nixûmandina por e. Mirov dikare bibêje ku cil û berg an jî serpoş, gelek caran ji pêdiviyeke xwezayî zêdetir wateyan dihewînin. Wekî têkbereke diyarde, derbarê kes û civakê gelek agahî û peyaman jî nîşanî me didin. Sazûmankarê zanista nîşanderiyê Saussure, her nişan ji nîşanderekî/ê û tiştê nîşankirî pêk tê. Ji têkilya navbera nîşander û tiştê nîşankirî jî wate diafire. Wate bixwe jî ew fahma ku nîşander di hişê kesê nîşangirtî de ava kirî ye (Köktürk & Eyri:2013). Li gorî peyrewê wî Roland Barthes, her nîşanekê, dengekî an têkberekê/î xwezayeke wê/î heye lê ji bilî vê di hişê mirov de temsîlîyetek û wateyên dîtir jî bi xwe re ava dikin. Helbet wate, ji nîşanê bixwe ne azad in lê peyamên ku didin jî hene. Gelek caran ji bilî wateyên esasî hin wateyên têkildar û serbixwe jî dihebînin (Bouzida, 2014:1003-1004). Ev xebat, li ser amûr, cure û rêbazên serîgirêdana jinên herêma Semsûrê ango kevneşopiya kofî/çît û kulikê jinan hûr dibe. Ji ber erdnîgariya bajarê Semsûrê çanda serîgirêdana jinên Kurd -kêm be jî- hîn didome.

Bajarê Semsûrê (bi navê fermî Adıyaman), ji aliyê başûr û başûrrojhilat ve bi bendava Atatûrkê hatiye pêçan. Li bakurê Semsûrê jî çiyayên bilind û asê rêz dibin. Ev teşeya erdnîgariyê bi awayekî xwezayî bûye sedema parastina çanda qedîm ya Kurdan. Yek ji nimûneya vê çandê serîgirêdan ango xêliya jinên kurd e. Li herêmê wekî "kofî" ango çît û kulik" tê navlêkirin. Di girêdana kofiyê de berê li gorî mezinbûna serî pirtiyên qedîfe ango empîrme "kum" tê dirûtin. Piştre dîsa bi pirtiyên rengîn ên bermayî "şidika binstû" tê amadekirin. Pirti, du-sê caran li ser tê dutakirin û dirûtin. Jin, kum didin serê xwe û dirêjahiya şidikê dipîvin. Şidik di rasta her du guhan de bi kum ve tê dirûtin. Dema ku kum didin serê xwe şidikê jî di bin çena xwe re derbas dikin. Bi vî rengî kum li ser serê jinan sabît disekine. Di rêza sêyemîn de girêdana "çît"ê heye. Çît, piranî ji pirtiyê herîr û sirmeyê tê çêkirin. Etar ango bazirgan çîtan ji aliyê Rihayê (Urfa), Îranê an Helebê dikirin û tînin herêmê. Çît, li dora kum tê gerandin û li pêşiya serî wekî girêkekê tê girêdan. Bi vî awayî wekî qalibekî sabît dimîne. Piştî girêdana çîtê dora kitan ango kitana spî ye. Kitanê ji gûçikên (qunc/goşe) wê çep û rast duta dikin û davêjin ser çîtê. Herdu gûçikên dirêj li ser singa xwe digihînin hev û girêdidin. Ji bo ku kitan ji ser çît û kulik neşemite bi nîkeke zivîn ango zêrîn tê girtin. Herî dawî dora xeml û xişrên dora kofiyê ye. Qorek pîlik/pelikên ji zêr an zîv

bi pêşiya kofiyê ve tê daliqandin. Berî ku gelê herêmê bi amûrên teknolojiye û perwerdehiyê re hevnas bibin, cara pêşî di serdema derbasbûna ji zaroktiyê û ber bi keçikbûnê de jinên kurd kofî girêdidan. Di vê demê de çarika ser kofiyê rengîn e û bi morî û mircanan tê xemilandin. Dema ku jin dizewice, tenê çarika spî davêje ser kofiyê lê xişrên dora kofiyê zêde dibin. Dema ku jin pîr dibe, kofî sade dibe û xişr ji holê radibin.

Nivîskarê navdar Yaşar Kemal, ku bi selê xwe ji malbateke kurd e, di pirtûka xwe bi navê Nuhun Gemisi (Keştiya Nuh) de behsa kofiyên jinên Kurd dike û dibêje "Ji serpoşa ku didin serê xwe re "kofî" dibêjin. Pirtiyên rengîn ên hewrişîmî pêçane li dora kofiyê. Rengên baldar û dilbijok." (Kemal, 2004).

Dema ku em behsa çanda folklora civakekê bikin, di serî de çanda devkî, kevneşopî, xwarin libas û serpoş tê hişê mirov. Di li ser erdnîgariya kurdan, gelek cûreyên cil û bergan, serpoşan balê dikişînin. Xeml û xişrên jinan jî her dem bûne remza xweşikî, statû û desthilatiyê. Ji ber ku ji serdemên Antîk heta niha bi sedan şaristaniyan li ser herêmên kurdan desthilatiya xwe li dar xistine û her yekê ji wan çanda xwe li ser çanda şaristaniya berî xwe zêde kirine.

Tê zanîn ku di çanda kurdan de gelek cureyên serîgirêdana jinan hene. Mijara vê danezanê çanda serîgirêdana jinên kurd e. Bi taybetî, em dê li ser kofiya jinan hûr bibin. Lewra kofî xemleke netewî ya kurdan e. Ji aliyekî ve xeml û xweşikiya jinan diyar dike ji aliyê din ve jî berdevkiya çanda kurdan dike. Di kofiyê de remzên kurdî xûya dikin. Ji ber ku jinên Kurd, heta nîveka sedsala 20an jiyana xwe piranî li gûndewaran derbas kirine, wekî gelek kevneşopiyên din kevneşopiya kofîyê- bi devoka Semsûrê çît û kulik- heta îro li ser piya maye. Jinên Kurd, di jiyana xwe ya rojane de, di şahiyên wekî hinne, dawet, nîşan û cejnan de kofiyên xwe didin serê xwe, dora wê dixemilînin. Bi vî rengî hem ji kevneşopiya xwe didomînin hem jî bala her kesê xerîb bi hêsanî dikişinin (T.C. Kültür ve Turizm Bakanlığı, 2022). Ev xebat, bi mebesta nirxandina derbarê daneyên kofiya serê jinên kurd, hêvî dike ku rewşa bikaranîna kofiyê ya roja îroyîn û peywirên wê destnîşan bike hatiye amadekirin.

**Rêbaz**

Hîmê vê lêkolînê, li ser nêrîn û çavdêriyên jinên ku hîn kofiyê didin serê xwe an jî berê kofî dane

serê xwe lê niha dev ji vê kevneşopiyê berdane ye. Tecrûbe û baweriyên jinan yên li ser kofiyê (serpoş) di hilbijartina wan de diyardeya sereke ye. Ji ber vê yekê, di xebatê de rêbaza lêkolînê yên têkildar (fenomenoloji) wekî desenê rêbaz hate hilbijartin. Sebeba hilbijartina vê rêbazê ev e ku berhemên ku derdikevin holê, pala xwe didin hişmendî û derûniyeke kûr. Herweha hemû zanyarîyên rast tecrûbeyên kesan vedihewînin (Babayiği, 2021; Cebi & Babayiğit, 2021; Creswell, 2013).

Ev xebata me lêkolîneke qadê ye û hîn di havîna 2017an de hatiye plankirin û xebatên qadê heta dawiya 2022an ajotiye. Asoya vê xebatê hemû jinên ku li Semsûrê dijîn û kofiyê dane serê xwe ne. Wekî nimûne 10 jinên ku hîn kofiyê didin serê xwe an jî heta demeke berê kofî dane serê xwe hatine neqandin. Di tesbîtkirina van jinan de rêbaza gogberfê hatiye bikaranîn. Di vê rêbazê de her kesa jêder, berê lêkolîner dide jêdereke din. Herweha di diyarkirina jinên ku dê hevpeyvînên rû bi rû bêne kirin de pîvanên wekî pejirandina hevpeyvînê, xwe îfadekirin û têkildariya ragihandinê hatine raçavkirin. Lêkolîner, ji bilî hevpeyvînan girîng daye çavdêriyên rasterast jî. Di dema hevpeyvînan de, derbarê perçe û bikaranîna kofiyê de wêne hatine girtin û teşeyên girêdana kofiyê ji aliyê reng, şêwaz û teşe ve hatine raçavkirin. Daneyên ku hatine berhevkirin, bi şêweya analîza destnîşanî (betimsel analiz) hatine dahûrandin. Têkilya bikaranîna kofiyê ya bi statûya jinan,  zayend, mezheb û eşîran hatiye nirxandin. Hêjayî gotinê ye ku mixabin ji ber sedemên cûda roj bi çanda kofîgirêdanê wekî berfa li ber rojê dihele. Bi taybetî erdhêja 6ê sibata 2023an gelek jinên kurd ên dawî ku kofî girêdidan di bin kavilan de jiyana xwe ji dest dan.

**Dîroka çanda kofîgirêdanê:**

Semsûr, hem ji aliyê çanda devkî hem jî ji aliyê çanda libas û serîgirêdana jinan ve xwediyê cihekî xwemalî ye. Di vê çanda sergîrêdana jinan de şopên hezarsalan, gel û baweriyên cûda hene. Em ji bermahiyên dîrokî fahm dikin ku li herêma Semsûrê, ji serdema Paleolîtîk heta niha gelek şaristanî bi cih û war bûne (Halaçoğlu, 1988:377). Her gelê ku li ser vê xakê bi cih û war bûye, şaristaniya xwe li ser şaristaniya berî xwe ava kiriye. Ji ol û baweriyan bigre heta bi rê û rêgezên jiyanê; ji çandiniyê bigre heta bi pergala sazkirina rêvebiriyê di hemû qadên jiyanê de pêşketinên nû li yên berê zêde kirine. Li Semsûrê, li deverên cihê gelek bermahiyên piştî serdema Paleolîtîk jî heta îro li ser piya mane. Lêkolînên ku li Şikefta Palaniyê, Heyderan û Xerabeyên Pîrînê hatine kirin diyar dikin ku dîroka vî bajarî digihêje 40 hezar sal beriya zayîna Hz. Îsa (Yurt

Ansiklopedisi, 1988:191). Li şûnwara Şehremûsê a navçeya Semsatê bermahiyên serdema Paleolîtîk (BZ. 7000) heta serdema Tûncê hatine dîtin. Herweha li gundê Encûzê (Bi Tirkî: Eskîtaş) li ser kêlên goristanên kevin xetên Hîtîtiyan hatine dîtin (Adıyaman Valiliği, 2018). Piştî Hîtîtiyan bi dorê Hurrî, Mîtannî, Kummuh, Asûr, Pers, Komagene, Roma, Bîzansî, Selçûqî û Osmaniyan jî li herêmê desthilatiya xwe li dar xistine (Toprak, 2018). Peykerên li serê çiyayê Nemrûdê, Keleha Kolikê, stûnên li derdora Bêhisniyê hîn li dar in. Ji ber vê yekê, bi hêsanî em dikarin bêjin ku Semsûr xwediyê dîrok û çandeke gelekî dewlemend û kevnare ye. Ev demlemendiya dîrokî xwe di çanda cil û bergên jinan de jî dide der. Bi taybetî jî di kofiyê jinan de. Hin lêkolînerên tirk, dixwazin çanda kofiyê bi baweriya şamanîzmê ve girêdin û ji pesendkirina vê yekê jî hin teswîrên serdema padîşahê Osmaniyan Siltan Silêman nîşan didin (Ağırmatlı, Begiç, 2021:30-46). Lê belê dema ku em li peykerên li serê Çiyayê Nemrûdê dinihêrin, em dibînin ku di serê peykerê xwedavendê Kommageniyan Fortuna de serpoşeke wekî kofiyên îro heye (TC. Kültür ve Turizm Bakanlığı, 2022).



**Fortuna (Xwedawenda Siûdê)**

Wekî serpoşekê çanda kofiyê ne tenê li herêma Semsûrê, li bajarên bakur yên wekî Sêwaz, Erzirom, Erzingan, Dêrsim, Mûş, Agirî, Bilîs û Hekariyê jî bi awayên cûda hebûna xwe

didomîne. Wek mînak, li gûndewarên bajarê Meletiyê, jin "kulik" didin serê xwe. Kulik, ji kulavê hirî tê çêkirin û bi şidikekê bi stû ve tê girêdan. Tasikeke zivîn an ji sifir didin ser kulik bi xişrên cuda tê xemilandin. Qoleke ji zêrên piçûk pêşiya kulik dixemilîne (Özus, Erden û Tufan, 2016:652).


Cil û ber û kofiyên jinên Kurd, ji berê heta niha bala lêkolîner û gerokên biyanî jî kişandiye. Gerok û folklornasê Brîtanî Lucy M.J. Garnett (1849-1934), di berhema xwe ya bi navê *"The Women of Turkey ande Theîr Folk-lore/Kurdish Women"* ku di sala 1891an de weşandiye de behsa jinên kurd dike û dibêje *ku "Li serê wan koloseke/kofiyeke giran heye. Dişibe taca serê Serkeşeyan (Psîkopos). Li ser wî kolosî şalên rengîn ên hewrişîmî hene. Kofî, tevî van serpoşan bi qasî 2 fîtan (61 cm) dirêj dibe. Guçikên (Kûnc/goşe) wan kofiyan heta erdê dirêj dibin. Hin ji van kofiyan bi sirmeyên rengzêrîn, pereyên kevin, pîlik û moriyan hatiye xemilandin. Ev kofî xemla jinên kurd e. Digel ku bikaranîna wê ne hêsan e jî hin ji wan bi şevê jî kofiyê xwe ji serê xwe danaxin. Guliyên pora wan li her du aliyan xwe berdide xwarê* (Bayrak, 2002:131). Serbazê Brîtanî E.W. Charles Noel, di berhema xwe ya bi navê "Diary of Major Noel on Specîal Duty in Kurdistan (1919)" de behsa eşîrên herêma Semsûrê dike û dibêje ku *"Jinên ku ji mezheba sûnniyan e kum didin serê xwe û çîta sipî davêjin ser kum."* (Noel, 2014:88).

Digel ku teqez naye zanîn bê ka di kîjan serdema jiyanê de kofî tê girêdan, li gorî lêkolînên ku me li gundewarên Semsûrê kirine û agahiyên ku me ji jêderên zindî wergirtine kofî di derbasbûna zaroktiyê ta heyama xortaniyê de wekî diyardeyekê tê pêkanîn (“Adıyaman'da kofi kültürü kayboluyor.”. (“Adıyaman'da kofi kültürü kayboluyor,” 2022). Li hin herêman di dema xelatkirin ango dawetê de kofî bi rê û rismekê tê girêdan. Ji ber ku kurd wekî eşîran bi rêxistin bûne, her eşîrekê jî li gorî xwe rêbazeke lixwekirina kincan (libasan) û serpoşan a xwemalî diyar kiriye û li gorî wê kevneşopiyê jiyana xwe saz kirine. Ev kevneşopî nasnameya jinan a civakî jî diyar dike. Wek mînak, jinên ji eşîra Kawiyan piştî ku çît û kulik didin serê xwe kitaneke spî (gewr) û dirêj davêjin ser kofiyê. Jinên ji eşîra Îzoliyan berê kum didin serê xwe, piştre kitana spî davêjin serê xwe û piştre çîta zivîn li dora kitanê dipêçin. Li gorî lêkolîner û nivîskar Turan, jinan berê kêm caran kofiya serê xwe bi temamî davêtin. Ew jî ji ber sedemên tendirûstiyê bû. Lewra kum ji kulavan dihate çêkirin û tevî çît û xişrên din gelekî giran dibû. Ew yek jî dibû sedema serêşê. Lê mixabin, têkilî pêşketinên şaristanî û nûjenîbûnê roj bi roj çanda eşîrtiyê qels dibe û nifşên nû êdî

kofiyê nadin serê xwe. Û herweha gelek jinên navsal jî (piranî ji ber sedemên tendirûstiyê) dev ji kofiyê berdidin û tenê kitana spî didin serê xwe. Jinên nûcivan ji dêvila kofiyê tenê kitanê an şarpeyê didin serê xwe.

**Amadekirina Kofiyê**

Jin, bi alîkariya kofiya xwe hin peyamên bêdeng didin kesên hemberî xwe û civakê. Ji ber vê yekê amadekirina kofiyê karekî nazenîn e û baldariyê dixwaze. Şaşitiyeke piçûk dibe ku bibe sedema pirsgirêkên mezin. Lewra her kîtekîta kofiyê xwediyê wateyeke kûr e. Wek mînak, heger jinekê çîta xwe li ser kitanê girêdabe ew tê wê wateyê ku ev jin ji herêma deşta Semsûrê ye û endama eşîreke Henefî ye (J. 1,2,5). Herweha peydekirina têkberên kofiyê jî gelekî dijwar e. Hin perçeyên kofiyê ji welatên gelekî dûr û nirxeke biha têne temînkirin. Hin ji wan di encama xebatên gelek rojan de derdikevin holê. Lewra, serpoşa ku bi navê kofî an çît û kulikê tê penasekirin, komplekseke û ji tar (elb/fes), kum/kulik, şidika binstû, çît (serpoşa hewrişîmî), kitan, nîk û xişrên ku kofiyê dixemilîne pêk tê.  Ji ber vê yekê divê em bi kurtî danasîna van têkberan bikin. Lê bo ku em zanibin bê em behsa çi dikin divê em bala xwe bidin vê wêneya li jêr.



**Tar (Elb/Fes):**

Di amadekirina kofiyê de li gorî demê hin guhertoyên piçûk têne dîtin. Berê hîmê kofiyê "elbik" ango tar bû. Tar, ji depekî tenik ê wekî tara bêjingan dihate amadekirin. Berê qalibê serî dihate girtin da ku tar/elb li ser serî rûne. Dep, di avê de dihatê nermkirin an jî bi destê necaran her du aliyê depê wekî xelekekê bi hev ve dihate danîn. Bi vî rengî tar/elba serî dihate amadekirin. Piştre, aliyê ser ê tarê jî bi perçeyek depê ê gilover dihate nixamtin. Elb, ji aliyê hundir û derve ve bi pirtiyê qedîfe dihatê nixûmandin. Rengê pirtî li gorî daxwaza jinan diguheriya lê piranî rengên zer û zivîn dihate bikaranîn.



Tara bê xeml



Tara bi pirti pêçandî

Li herêma Semsûrê di demên dawî de ji dêvila tar/elbê qarton (kaxiz) dihate bikaranîn. Îro jî ne tar ne jî qarton (qaxiz) tê bikaranîn. Îro, ji dêvla tar û qartonî kum tê bikaranîn.

**Kum:** Ji aliyê teşe ve hinekî dişibe kumên misilmanan û cihûyan. Lê belê kumê jinan hem ji aliyê mezinbûn, hem jî ji aliyê pirti ve hinekî din cûda ye. Kum, ji pirtiyên pemboyî, empîrme û hwd. tê amadekirin. Ji bo ku xweşik xûya bike, ji pirtiyên rengîn perçe wekî sêgoşe têne birîn, Piştre hemû perçeyan li gorî lihevhatina wan didin rex hev û din û teşeyê kum diyar dikin. Hemû perçeyan bi hev û din ve didûrin. Pirti, teşeyê kilorê (gilover) digre. Li gorî mezinbûna serî mezinbûna kum diyar dikin. Heger pir firek û mezin be, hinekî jê dikin Derdora kum duta dikin û li ser hev dicivînin. Mebest ew e ku devê kum ber bi hev were û teng bibe. Lastîkê bi kar nayînin. Lewre dibe ku lastîk serê jinê biêşîne. Heger pêwîstî an daxwaz hebe pirtiyekî rengîn û xweşik jî bi nîveka kum ve pîne dikin. Di vir de mebest dîtbarî ye.

**Şidika Binstû:** Piştî ku kum hate amadekirin, dora amadekirina şidika binstû ye. Du fonksîyonên (erk/peywir) sereke yên şidika binstû hene. Yek sabîtgirtina kum a li ser serî ye, a din jî xeml ango dîtbarî ye. Şidika bin dîsa bi pirtiyên rengîn ên bermayî ên herî xweşik tê amadekirin. Ji perçeyê herî xweşik û rengîn yê pirtiyê bermayî, şidikeke bi qasî du-sê santîman (cm) firek û kêm zêde du bihostan dirêj tê birrîn. Şidik, li gorî tercîhê/daxwazê û pêwîstiyê du-sê caran li ser hev tê dutakirin û dirûtin. Jin, kumê ku berê amadekirine didin serê xwe şidikê jî di bin çena xwe re derbas dikin û bi vî rengî dirêjahiya şidikê dipîvin. Ê zêde dibirin. Piştre, şidik di rasta her du guhan de bi kum ve tê dirûtin. Di vir de divê jin zêdetir baldar bin. Ji ber du sedeman: Yek, heger şidik bi devereke şaş ve bê dirûtin dê hevsengiya kum xera bibe. Dido, heger kin be dê stûyê jinan biêşîne; dirêj be dê sist bimîne û nahêle ku kofî li ser serê jinê bisekine. Bi vî rengî kum bi alîkariya şidika binstû li ser serê jinan sabît disekine.

**Çît (Serpoşa Hewrişîmî):**

Çît, pirtiyeke hewrişîmî ye. Jinên herêmê, di demên berê de di tevnan de bixwe çîtên xwe hûnane. Lê belê ji ber ku peydekirina hewrişîm gelekî zehmet bûye çît ji pembo û hiriyê hatine hûnandin. Piştî ku bazirganî -bi taybetî jî qaçaxiya titûnê û çayê- li herêmê pêş ketiye, têkilî bi herêmên din re hatiye danîn û çît ji herêmên wekî Riha, Diyarbekir û Helebê hatine anîn. Bi gumaneke mezin, çît ji herêmên Asyaya Navîn û Asyaya Dûr hatiye welatên Îran û Suriyeyê û ji wir jî hatiye nav Kurdên Tirkiyeyê.

Ji aliyê teşe û mezinbûnê ve çîtên ku li herêma Semsûrê têne bikaranîn hemû kêm-zêde bi qasî hev in. Berê çîtan bi qasî metroyekê ye û dirêjahiya wan jî nêzikî du metroyan e. Her çar aliyên çîtan bi gulikan hatine xemilandin. Ji aliyê pirtiyê ve sê cureyên çîtan derdikevin pêş: Çîtên herî hêja, temendirêj, xweşik û bi nirx ji hewrîşim têne çêkirin. Hewrîşîm piraniya wê bi rengê sirme (zêrîn) e lê di nav de xetên reş jî hene. Bi vî rengî reş û zer xweş li hev tên. Dema ku ji dûr ve tê xûyakirin dibiriqe/diperije. Cureyê duyemîn ji pembo tê çêkirin û vê carê xetên reş li ser rengê spî/gewr bi cih dibin. Dora vî cureyê bi gulikên spî hatiye xemilandin. Li gorî çîtên sirme gelekî sivik in. Cureya herî dawî de sentetîk û pembo bi hev re hatine bikaranîn û tenê spî/gewr e. Ji hemû cureyan siviktir e. Jinên herî xizan, yên zêde oldar û yên pîr ku êdî nikarin giraniyê li ser serê xwe bihêlin vî cureyî bi kar tînin.

**Kitan:**

Kitan ango çarik, serpoşa dawî ya kofiyê ye. Berê ji hiriyê jî dihate hûnandin lê yên sedsala dawî hema bêje hemû pemboyî ne. Mezinbûna kitanan bi qasî1,5-2 metroyan e. Gelekî sivik in. Berê wan û dirêjahiya wan nêzikî hev e. Rengê wan li gorî rewşa aborî, jiyana rojane, eşîr û mezheban diguhere. Keçik di demên civantiyê de kitanên rengîn davêjin ser kofiya xwe. Piştî ku zewicîn piranî kitanên spî bi kar tînin. Jinên ku li gundan dijîn û karên çandiniyê û sewalxwedîkirinê re mijûl dibin, di nav malê de kitanên rengtarî bi kar tînin. Di şîn, pîrozbahî, dawet û mêvandariyan de kitana xwe ya spî bi kar tînin. Jinên ku girêdayî mezheba Elewîtiyê ne, kitanên rengîn û yên spî jî bi kar tînin (J. 1, 2, 3, 5, 6). Lê jinên girêdayî mezheba Henefîtiyê bêtir yên spî bi kar tînin. Kitanên jinên nûciwan dora wan bi morî û mircananên rengîn nexişandî ne lê jinên navsere kitanên sade bi kar tînin. Di pîrozbahiyên netewî (wekî Newrozê) kitanên ku bi morî û mircanên kesk û sor û zer hatine xemilandin têne bi kar anîn. Di bikaranîna kitanê de teşe û rêbaz li gorî mezbeban û eşîran diguhere. Hin jinên Elewî kitana xwe ji goşeyên dûrî hev û din duta dikin. Kitan dibe sêgoşe. Goşeyekî wê li nîveka piştê rast tê û her duyên din jî di ser milan re dadikevin ser singê jinan û li wir bi hev û din re têne girêdan. Ji bo ku li ser kofiyê neşemite jî bi nîkekê an derziyeke devgirtî (fîrket) bi pêşiya çîtê ve tê sabîtkirin. Hin jinên gundewarî (çiyayî[*]) kitana xwe duta nakin. Goşeyekî li dehma eniya xwe, yekî li nîveka pişta xwe rast tînin û her duyên din jî li ser singa xwe, an jî bin stûyê xwe digihînin hev û din (J. 4,7,8,). Jinên ku kitana xwe bi vî rengî bi kar tînin, li gorî rewş û derfetên xwe zêrekî an jî pîlikekî/pelikekî bi goşeyê li dehma eniya xwe ve dadilqînin. Ev pîlik/pelik hem xeml e, hem jî hevsengiya kitanê tekûz dike. Jinên ji eşîrên Henefî (bi devoka herêmê"Sûnnî/Sinni"), kitana xwe di bin çîta xwe de davêjin ser kumê xwe. Piştre çîta xwe li serê xwe dipêçin. Kitanên wan piranî spî ne û bê xeml û xişr in (J. 2, 5, 9).

[*] Ji ber ku herêma Semsûrê ji aliyê erdnîgariyê ve nêvî deşt e û nêvî jî çiya ye, li herêmê gel wekî "deştî" û "çiyayî" jî tê dabeşkirin. "Deştî" hinekî pêşketî lê çikûs, "çiyayî" jî paşdemayî û "destfireh/camêr/comerd" têne penasekirin. Helbet ev yek, li gorî kes, dem û derfetan diguhere lê di nav gel de kevnebaweriyeke bi vî rengî heye.



**Kitaneke spî ya herêmî**

**Di bikaranîna kofiyê de bandora rewşa aborî:**

Teşeyê girêdana kofiyê wekî ku li jorê jî hatibû diyarkirin li gorî rewşa aborî ya jinan naguhere. Lê belê çawaniya (qelîte/nirx) kofiyê li gorî rewşa aboriya jinan diguhere. Jinên maldar, kumê xwe ji pirtiyên hewrişîmî amade dikin. Çîtên wan ji sirmeyê hewrişîm in û ji yekê zêdetir in. Bi dorê çîtên xwe didin sere xwe. Li gorî derfetên aborî, çîta nav malê û ya mêvandariyê, çîta şîn û dawetan ji hev cuda ne. Dema kû çîta wan hinekî kevin dibe bi xêra xwe didin jineke feqîr (J. 7,8,10). Jinên dewlemend, berê qolê zêran ku herî kêm ji bîst û çar zêran pêk dihat bi pêşiya kofiya xwe ve dadiliqandin. Jinên ku rewşa wan a aborî qels e, ji dêvila çîta hewrişîmî çîtên pemboyî bi kar dianîn û ji dêvla zêran jî bi xişrên zivîn û hwd. kofiya xwe dixemilandin. Herweha ji bo ku çîta wan kevin nebe, gelek caran kitaneke kevin ango şareke kevin didan serê xwe. Dema ku kesekî xerîb li kofiya jinekê binihêrta rewşa malbata wan aborî kêm zêde pêşbînî (texmîn) dikir. Jêder Ş.P div ê mijarê de weha dibêje:

"Berê feqîrî pir bû. Çît jî ê pir biha bûn. Hîn jî ê biha ne. Xelî (gelek) jinan emrê xwe bi çît û kulikekî derbas dikir. Min bixwe çît û kulik neda serê xwe. Lê ê diya min heta ku mir jî li serê wê bû. Tim mistik zêr di ber kulikî xwe de vedişart. Digo, *'Zêrê meriya, pişta meriya ne.'* Ê bavî min qaçaxiya titûn dikir. Diçû Urfê (Riha), Heranê, heta Binxetê[*] diçû. Êkcaran çîtên rind dikirîn û tanîn li vir difrotin. Li wê derê bi titûnî qaçax diguhartin. Loma ê serî diya min ê tim nû bû."

---

[*] Kurdên Tirkiyeyê, ji bo bakur û bakurrojavayê Suriyeyê têgeha "Binxet"ê bi kar tînin. Lewra sînorê Tirkiyê û Suriyeyê bi vê xeta trênê ji hev diqete. Heta ku mayin li herêmê hatin raxistin (û van salên dawî jî dîwarên mezin)

Namzetên zavatiyê, berî ku daweta xwe li dar bixin, wekî diyarî ji destgirtiya xwe re çît û pirti dikirîn. Keçikan jî bi van diyariyan li bal hevalên xwe forsa xwe dirêtin. Berzavayên ku nikaribûn çîtên sirme ji destgirtiyên xwe re bikirin, kitan û xişrên zîvîn wekî diyarî dişandin malxezûranên xwe (J.6).

Jinên ku demekê li gundan mane û piştre çûne li navenda bajarê Semsûrê bi cih bûne, li wir bi çanda bajariyan re hevnas bûne. Him di bin bandora wan de mane û him jî nexwastine ku dev ji kevneşopiyên xwe berdin. Ji ber vê yekê jî hîzara reş ku jinên bajarî ango peywirdarên dewleta Osmaniyan li xwe dikirin, di ser kofiyê de li xwe kirine.

**Nîk û Xişrên Kofiyê:** Nîk, hem ji bo sabîtkirina kitanê ya li ser kofiyê pêwîstiyek e, hem jî xemleke xweşik a jinan e. Nîkên berê ji zêr an zîv bûn. Bi qasî zêrekî nîv bûn, Li ser nîkan çînikên (nexş/nîgar), rengîn hebûn. Di navbera herdu seriyên nîkan de zincîreke duta ya bi qasî bihostekê hebû. Aliyekî nîkê bi pêşiya çîtê ve tê girêdan, aliyê din jî bi kitanê ve dihate girêdan (J. 1,2,3,5,8,10).



Kurdên Bakur û yên Rojava di navbera her du perçeyan ji bo bazirganiyê carinan jî ji ber sedemên siyasî diçûn û dihatin.

Xemlek zîvîn ji bo ser kofiyê.

Li hin herêmên Semsûrê ji van xîşran re "rîşme" yan "reşme" jî tê gotin. Li gorî rewşa aborî ya jinên ku kofiyê didin sere xwe xeml û xişir ji zêr, zîv an jî pîlikên sifir jî pêk tên. Heger tiştek tunebe ji paçikên rengîn stêrkekê didin ser hev û bi fîrketeyekê kitanê û kofiyê bi hev ve girêdidin (J.9,10).

## Encam:

Wekî encam hate dîtin ku “kofî” ango “çît û kulik”, beşeke hêja ya xemla jinên Kurd e. Herweha xemleke netewî ya Kurdan e. Her perçeyekî kofiyê ji bilî têkbereke şênber sembolek e û gelek wateyên çandî, dîrokî û derûnî din ava xwe de dihebîne. Îro kêm be jî li herêma Semsûrê ji aliyê hin jinên navsere yên Kurdan ve tê bikaranîn. Kofî ango çît û kulik, ji aliyekî ve xeml û xweşikiya jinan diyar dike ji aliyê din ve jî berdevkiya çanda Kurdan dike. Sergirêdana/serpoşa jinan a bi kofiyê li gorî serdemên jiyanê (keçik, bûk, jina zewicî ya navsal, jinebî, pîrejin), mezheb û eşîran teşe û reng diguherîne. Lê mixabin çandeke li ber windabûnê ye. Di salên dawî de keçik û jinên ciwan nema kofiyê didin serê xwe. Li herêmê kêm jinên pîr û navsal vê çandê didomînin. Berî ku ev çand ji holê rabe divê lêkolîn û xebatên tomarkirina vê çandê bêne zêdekirin. Ev yek ji bo parastin û jiyandina çand û folklora kurdan girîng e (Tanrıkulu & Babayiğit, 2021a; Tanrıkulu & Babayiğit, 2021b).

## Jêder

Ağırmatlı, HH., & Begiç, HN. (2021). Anadolu’da Kaybolmakta Olan Geleneksel Bir Giyim Kuşam Unsuru: Zaza Püskülü. *Çeşm-i Cihan: Tarih Kültür ve Sanat Araştırmaları Dergisi E-Dergisi*. *8*(2), 30-46.

Babayiğit, M. V. (2021). Investigating the Perceptions of KNL (Kurdish as a Native Language) and EFL (English as a Foreign Language) Learners towards Distance Learning in Online Kurdish and English Classes. In Balcı, T., Öztürk, O. & Aksöz, M. (Eds). *Schriften Zur Sprache und Literatur V,* (5th ed., pp. 76-88). Istanbul, Turkey: Çizgi Press.

Bayrak, M. (2002). “Geçmişten Günümüze Kürt Kadını”, Haz. Mehmet Bayrak, *Geçmişten Günümüze Kürt Kadını*. Ankara: Özge.

Cebi, A., & Babayigit, M. V., (2021). A cross-cultural study of the speech act of apology by Turkish and Kurdish Speakers of English and the native English speakers of English. *Şarkiyat, 13*(2), 895-909.

Creswell, J. W. (2013). Nitel Araştırma Yöntemleri: Beş Yaklaşıma Göre Nitel Araştırma ve Araştırma Deseni, (3. Baskıdan Çeviri). Çeviri Editörleri: M. Bütün ve SB Demir). Ankara: Siyasal Yayın Dağıtım.

Çiftçi, Y. & Çifçi, T. (2024). Başımdaki Dünya, Adıyaman'ın Son Kofili Kadınları. *Atlas Dergisi*. 369, rr. 54-70.

Bouzida, F. (2014, September). The semiology analysis in media studies: Roland Barthes Approach. In *Proceedings of SOCIOINT14-International Conference on Social Sciences and Humanities* (Vol. 8, No. 10, pp. 1001-1007).

Halaçoğlu, Y. (1988). "Adıyaman", Türkiye Diyanet Vakfı İslam Ansiklopedisi**.** C.1. İstanbul: TDV Yayınları.

Kemal, Y. (2004). Nuhun Gemisi/Bu Diyar Baştan Başa. İstanbul: YKY Yayınları.

Köktürk, Ş., & Eyri, S. (2013). Dilbilim ve göstergebilim: Ferdinand De Saussure ve göstergebilimi anlamak. *Sakarya Üniversitesi Fen-Edebiyat Dergisi, 2*, 123-136.

Noel, EWC. (2014). Diary of Major Noel on Special Duty in Kurdistan (Kürdistan 1919 Binbaşı Noel'in Günlüğü). Wergera ji Îngilîzî bo Tirkî: Bülent Birer, 3. Baskı. İstanbul: Avesta.

Özus, E., Erden, F., & Tufan, M. (2016). Malatya Yöresi Geleneksel Kadın Kıyafetlerden Günümüze Yansımalar. *International Journal of Sport Culture and Science, 2* (Special Issue 1), 650-664.

Tanrıkulu, V., & Babayiğit, M.V., (2021). The Elements of Classical Roman in Jana Gel, *Kurdiname*, 5, p.48-57.

Tanrıkulu, V., & Babayiğit, M. V. (2021). Common Mythological Legendary and Religious Heroes in the Divans of Serda and Hesbi. *Kadim Hikmet Uluslararası Sosyal Bilimler Dergisi, 3*(5), 22–34.

Toprak, SV. (2018). Hısnımansur, Adıyaman: Adıyaman Üniversitesi Yayınları.

Yurt Ansiklopedisi (1981). C.1, s.191. İstanbul: Anadolu Yayıncılık.

**Jêderên Dîjîtal**

Adıyaman Valiliği. (2018, Temmuz 3). *Adıyaman tarihi*. https://www.adiyaman.gov.tr

Adıyaman'da kofi kültürü kayboluyor. (2022, Sıbat 1). *YouTube*. https://www.youtube.com/watch?v=ytnityX3lkU&ab_channel

Turan, Hüsamettin "Kofî Bir kadın Aksesuar Giysisi ve Parçasıdır." http://memlekethavadis.com/haber/kofi-bir-kadin-aksesuar-giysisi-ve-parcasidir-20958.html 01.01.2022.

T.C. Kültür ve Turizm Bakanlığı. (2022, Şubat 1). *Nemrut Dağı (Adıyaman - Kahta).* https://kvmgm.ktb.gov.tr/TR-44428/nemrut-dagi-adiyaman---kahta.html

T.C. Kültür ve Turizm Bakanlığı. (2022, Ocak 18). *Yöresel giysiler (Lîbasên herêmî)*. https://igdir.ktb.gov.tr/TR-55676/yoresel-giysiler.html

**Jêderên Zindî**

1. Ayşe Kaygusuz, 96 salî, ji navçeya Cêlikan (Çelikhan)/Semsûr. 07.07.2017.
2. Bedriye Turhan, 70 salî, ji gundê Gelera/Semsûr. Dîroka hevpeyvînê: 06.11.2022.
3. Besê Yolun, 69 salî, ji gundê Narincê/Semsûr. Dîroka hevpeyvînê: 26.01.2022.
4. Fatma Akın, 74 salî, ji gundê Kurê Milê/Semsûr. Dîroka hevpeyvînê: 08.11.2021.
5. Gulî Sever, 90 salî, ji Bajarokê Komîrê/Semsûr. Dîroka hevpeyvînê: 15.07. 2021.
6. İsmihan Aslan, 75 salî, ji bajarokê Komîrê/Semsûr. Dîroka hevpeyvînê: 06.11.2022.
7. Muzeyyen Selçuk, 69 salî, ji gundê Gelera/Semsûr. Dîroka hevpeyvînê: 06.11.2022.
8. Nure Kaya, 65 salî, Semsûr. Dîroka hevpeyvînê: 15.07.2021.
9. Şîrîn Pulat, 52 salî, ji gundê Qozanê/Semsûr. Dîroka hevpeyvînê: 25.01.2022.
10. Zeynep Koparal, 70 salî, ji gundê Çarkeziyê/Semsûr. Dîroka hevpeyvînê: 26.01.2022.